

**Ragirtina xebatê bo me cihê baskirin û pirsyarkirinê nîne**

»»» R:5



*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siyasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*
*www.agirimedia.org Hejmar (334)22-09-2018 Buha (1000) Tûmen*



## Mistefa Hicrî: Emê qonaxeke nû a xebatê li dijî rejîma Tehranê dest pê bikin

»»» R:3

## Bajar çekê hildigre

»»» R:2



## Xermanana cinayetên rejîmê û hemaseya Kurdistanê

Roja 17-ê Xermananê xaleke din ya reş bû li ser eniya rejîma komara faşîst ya Îslamiya Îranê, ku tê de cinayeteke jibîrnekirî li dijî gelê mafxwaz ê Kurd hate encamdan, bê xeber ji vê ku ew şaşiya stratejîk, çend rojan piştre hemaseyeke nîştimanî û neteweyî jê şîn dibe.

Roja 17-ê Xermananê bû ku Komara Îslamî bi xeyala xwe ya xaw xwast ku bi serkut û tundtûytîjiyê wate îdam lawên Kurd û mûşekbarana binke û baregehên Hizba Demokrat li nav kûrahiya xaka Herêma Kurdistanê de ku bû sedema şehîd û birîndarbûna têkoşerên riya azadiyê, pêşiya berdewamiya tevgera neteweyî bigrin, lê xelkê Kurdistan, li roja 21-ê Xermananê de Tehran da ber mûşeka xwe ya bêdeng.

Her li destpêka roja Çarşemiyê, ku dema birêveçûna gireva giştî bû, xelkê pêşwaziyeke baş ji bangewaza Navenda Hevkariya Hizbên kurdistaî kirin, û bi venekirina deriyê dukan û bazarên xwe tovê hêviyê di dilê gel de çandin û rejîm heyrîmayî kirin.
Renge yek ji xalên girîng ên nerizayetînîşandana aram ya vê carê ew bû ku



hemû Kurdistan bi xwe ve girt ku ew yek nîşana yekgirtîbûn û yekdengiya fikrî û hizrî ya neteweya Kurd li Rojhilata Kurdistanê li hemberî qedera gelê xwe de bû.

Ew gireva sertaserî bersivek bû bo nîşandana hevpêwendiya organîk ya Çiya û Bajar, bi vê watayê ku hemû tex û qatên civakê rol tê de lîstin, wate Hizban, Xelkê asayî, û Nuxbeyan (bijardeyan), ku sêgoşeyek bo lerizandina zêdetir ya pêpikên rizî ên deshilatê di heyameke kurt de pêk anîn.

Hemase û destanrêsiya 21-ê Xermananê rast wekî avêtina mûekeke bêdeng bû ber bi Tehranê, ku deshilata Tehranê bi mûşekên xwe ên bideng jin û zarokên bêberevan kiribûn armanc.

Ew cinayeta di mehekê de rû da, ku rast bibîrhînerê cinayeteke din ya rejîma terorîst ya Îranê bû, ku ew jî terora li Mîkonosê di 26-ê Xermananê de bû.
Piştî vê bûyerê hemû salekê ew şehîd têne bibîranîn. Her di vê çarçoveyê de bi beşdariya beşek ji edamên rêberî yên hizbê, kadr, pêşmerge, endam û dilsozên hizbê, rêûresma bilindragirtina bîranîna şehîdên Mîkonosê hate lidarxistin.

Roja Duşemî rêkefta 26`ê Xermanana 1397`an, li kempa Cêjnîkan ya Partiya Demokrat, rêûresmeke taybet bi 26.mîn salroja terora nacamêrane ya şehîdên Mîkonosê hate lidarxistin.

Ev rêûresma bi xwendina sirûda neteweyî ya "Ey Reqîb" û ragirtina bîstekê bêdengî ji bo rêzgirtin ji riha pak ya şehîdên Kurdistanê dest pê kir.

## Fermandariya Hêza Pêşmergê Kurdistanê daxuyaniyek belav kir




**Fermandariya Hêza Pêşmergeyê Kurdistanê derbarê nasnameya şehîdên nû ên gel daxuyaniyek ji bo raya giştî belav kir.**

Daxuyanî wiha ye;

Daxuyaniya Dezgeha Fermandariya Hêza Pêşmergeyê Kurdistanê

Roja 17'ê Xermananê a sala 1397'an a Rojî (8'ê Îlonê a 2018'an a Rojî) di encama êrîşa mûşekan de a bo ser baregehên Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê li Koye, du pêşmergeyên hizbê hatibûn şehîdkirin. Me berê şehîdbûna du kesan ragihandibû û navên wan jî ev in;

»»» R:3

Sergotar

# Bajar çekê hildigre

N: Kerîm Perwîzî



Serberedayî û dîktatorî û stemkariya berdewam ya her sîstemekê wisa li xelkê dike ku helwest û serhildana xwe tund û tundtir bikin û hekî sîstemekê tu deriyeke wê bo başkirin û guhdariya dengê xelkê tunebe, eva xelk bi neçarî heta asta herî bilind ya berbirûbûna digel rejîmê diçin.

Rejîma Îranê nêzî çar dehikan e ku bi hemû şêweyekê stema çend qat li ser hemû xelkê Îranê û bi taybetî li ser neteweyên zulmlêkirî bi rê ve dibe. Vê rejîmê tu derfetek nehêlaye bo dana mafê xelkê û neteweyan û hemû riyên siyasî û medenî û kulturî û civakî ku ji aliyê xelk û têkoşerên siyasî ve hatiye peyrewkirin, digel tundtirîn şêwaza serkutê berbirû bûye, û heta çalakên jîngehparêz jî li agirê stemkariya rejîma apartayd a Îslamiya Tehranê û Spaha Terorîstî ya wê de hatin şewitandin.

Xebata çekdarî ya Kurd di Kurdistana Rojhilat bo heyama du dehikan hate ragirtin û Kurd cuda ji berçavgirtina berjewendiyên neteweyî di beşeke din ya Kurdistanê de jî, ew derfet da rejîma Îslamiya Îranê ku di van bîst salan de pêngaveke siyasî bigrin pêş, bo vekirina rewşê bi rûyê xelkê Kurd, û Kurdistan ji vê hemû zext û milîtarîzekirin û kuştarê derbaz be, û Komara Îslamî di yasyaên xwe de guhertinekê pêk bîne, û Kurdistan bigihîje hinek ji mafên xwe ên destpêkî.

Lê Komara Îslamî di van bîst salan da tenê serkut û asîmîlasyon zêdetir kir, bangewaza nemana xebata li Kurdistanê de kir û hewl da ku bedela çekê, mewada muxedir bide dest lawên Kurdistanê.

Evane û çendîn sedemên din Kurdistana Rojhilat naçar kirin ku qonaxeke din ya xebatê bigre pêş û Rasana Rojhiat ew qonaxa nû ye ku pêngavên xwe ên destpêkê dest pê kirine û pile bi pile ber bi kopîtê hildikêşe.

»»» R:3

# Amerîkayê terora rêberên PDKÎ anî bîra hevwelatiyên Îranê




**Balozxaneya mecazî ya Amerîkayê, bi belavkirina peyamên kurt di torên civakî de, terora rêberên Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê ya li bajarê Berlîn a welatê Almaniyayê bi bîra hevwelatiyên Îranê tîne.**

Balyozxaneya mecazî ya Amerîkayê di Îranê de, di kurte vîdyoyekê de nivîsiye ku: "Di vê dawiyê de di rûpelekê de îşare bi hin çalakiyên terorîstî yên rejîma Îranê di seranserê cîhanê de bi taybet Ewropayê kiriye, û 26 salan berî niha di rojeke wiha de roja 17`ê Îlonê çalakvanê siyasî yê Kurd, Dr. Sadiq Şerefkendî û 3 kesên din ji hewalên wî yên bi navê Fetah Ebdulî, Homayon Erdelan û Nûrî Dêhkurdî, di restorana Mîkonosê a bajarê Berlînê de hatne terorkirin û hûn derheq vê êrîşa teroîstî çi dizanin?

Di nîveka meha Sermawez a sala 1390`î de, Wezareta Derve ya Amerîkayê, hewla rêkxistina vê balyozxaneya întêrnêtî daye, ku zêdetir bi armanca gihandina zanyariyan bo hevwelatiyên ku di Îranê de akincî ne, hatiye avakirin.

Terora Mîkonosê di 26`ê Xermanana sala 1371`an di restorana bi wî navî li bajarê Berlînê hatiye encamdan, ku di vê bûyerê de Dr. Sadiq Şerefkendî sekreterê wê demê yê Partiya Demokrat, Fetah Ebdulî nûnerê vê partiyê li Ewropayê, Homayon Erdelan nûnerê PDKÎ li welatê Almaniyayê û Nûrî Dêhkurdî çalakvanê siyasî yê Kurd hatne terorkirin.

Dadgeha Mîkonosê di heyama sê salan de, 247 civîn û bi şahidîdana 176 kesî derheq dosiya terora Mîkonosê de pêk anîn, û hikûmeta Îranê bi encamdana "terorîzma dewletî" şermezar kir.

Hukmê dadgeha Mîkonosê di meha Îlona 1998`an de bi tevahî misoger bû, û berpirsên rejîma Îranê di bilinditirîn astê de, di vê dosiya terora Mîkonosê de hatine şermezarkirin.

# Xûşka sê şehîdên PDKÎ koça dawiyê kir



Li bajarê Urmiyê xûşka sê şehîdên PDKÎ koça adwiyê kir.

Li gora nûçeya ku gihîştiye malpera "Kurdistanmedia"yê, roja Înê 23`ê Xermanan a sala 1397`an, Hacî Hebîbe Heqîqî xûşka sê şehîdên PDKÎ ser bi gundê Gîsyan a ser bi navçeya Mergewer a Urmiyê çû ber rehmetê.

Navbirî keça şehîd Selîm Heqîqî ye, ku ew jî pêşmergê PDKÎ bûye, ku di şerekî de li dijî dagîrkerên kurdistanê tevlî karwanê şehîdan bû. Hevdem Hecî Hebîbe xûşka sê şehîdên PDKÎ bi navên Tahir Heqîqî, Xelîl Heqîqî û Sadiq Heqîqî ye, ku du birayên qehreman ên navbirî digel bavê xwe şehîd bûne.Birayekî Hebîbe xanimê jî, endamê PDKÎ bûye, ku ji aliyê rejîma cellad ve hatibû destbiserkirin, û piştre hatibû îdamkirin.PDKÎ sersaxiyê dibêje xizm û kesûkarên navbirî û xwe şirîkê xemêt wan dizane.

# Fermandariya Hêza Pêşmergeyên Kurdistanê daxuyaniyek belav kir




-Şehîd "Farûq Hesen Xeyat" ku sala 1365'an a Rojî (Sala 1986'an a Zayînî) li bajarê Bokanê di malbateke niştîmanperwer de ji dayîk bû û piştî derbaskirina qonaxên xwendinê, bawernameya Karnasiya Bilind a Muhendisiya Çandiniyê li zanîngehê stand. Şehîd Farûq, mînaka pêşmergeyekî jêhatî, wêrek û hişyar bû ku karîbû bi jêhatîbûna xwe bibe mamosteyê fêrgeha PDKÎ û weke kadirekî siyasî û nizamî, erkên rasipartî bi başî bicî dikirin.

- Şehîd "Muxtar Qadirpûr" sala 1364'an a Rojî (1985'an a Zayînî) li gundê Tayirboxe ê Seqizê di malbateke geldost de ji dayîk bû. Şehîd Muxtar yek ji wan pêşmergeyên wêrek, jêhatî û dilsoz bû ku bi hemû şiyana xwe kar û erkên hizbî bicî dikirin û bi kiryarên xwe ên şoreşgêrane bibû mînaka pêşmergeyekî baş ji bo hevçeperên xwe. Pişt re wî karî bibe mamosteyê fêrgehê û waneyên siyasî û çekdarî didan fêrxwazên dewreya seretayî a pêşmerge.

Ji alî din ve li gor zanyariyan, roja 19'ê Gelawêja îsal, du pêşmergeyên çeleng û wêrek ên Hêza Pêşmergeyên Kurdistanê di şer û pevçûnên Kêleşînê de bi birîndarî ketin dest hêzên terorîst ên Komara Îslamî û di rojên derbasbûyî de hatine şehîdkirin. Navên wan du pêşmergeyên serbilind û qehreman ku heya fîşeka dawiyê jî şer kirin û bi birîndarî hatin girtin, ev in;

-Şehîd "Ehed Şebab" kurê Qadir, xelkê Mehabadê ku sala 1395'an tevlî refên pêşmergeyên Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê bû.

-Şehîd "Nasir Ezîzî" kurê Xalid naskirî bi Hejar, xelkê Mehabadê bû ku di refên pêşmergeyên Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê de xizmeta xak û niştîman dikir. Em weke rêberiya PDKÎ û Fermandariya Hêza Pêşmergeyên Kurdistanê, ji bo şehîdên 17'ê Xermananê û du şehîdên şerê Kêleşînê sersaxiyê didin hemû xelkê Kurdistanê û malbatên wan şehîdan û xwe hevparê xemên




wan dizanin. Ruhê wan şad be.

Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê
Dezgeha Fermandariya Hêza Pêşmergeyên Kurdistanê

**18'ê Xermananê a 1397'an a Rojî (9'ê Îlonê a 2018'an a Zayînî)**

---

**»»» Doma sergotarê**

Rasan pêk nahê ji vê ku tenê erk û wezîfeya rizgariyê bixe stûyê pêşmerge û çiya, belku pêk tê ji pêkvegirêdana xebata çiya û bajar, wate hemû biyavên civakî û siyasî û neteweyî ên xebateke nîştimanî ku neteweyek dikare bigre pêş, da ku hemû pêkve xebateke cemawerî bi rê ve bibin, û çi yek ji wan ji ên din kêmtir nebin, yanî çiya û bajar pêkve xebateke berfireh bi rê ve bibin heya gihîştina bi kopka serkevtin û avakirina nîştimaneke nû.

Di vê rewşa nû de jî em dibînin ku Koamara apartayd ya Îslamiya Îranê wekî hertim ji xelkê û mafên wan tê nagihîje û tenê dixwaze bi nimayişên leşkerî û kuştar û tawanan û terorê pirsa serekî ji bîr bibe.

Di hemberî vê taktîka Komara Îslamî de em dibînin ku hêdî-hêdî, bajar jî dest dide çekê bo parastina xwe. Hekî pêştir jî xebata pêşmerge pêk dihat ji hebûna tîm û hêza pêşmerge li çiya û hêza rejîmê bi çek û teqemeniyên pêşkevtî derbe lê dixist û bi mûşekan li binke û baregehan dida, lê niha bajarê çekdar dibe bellaya serê hêza serkutker ku di nav xwe de wê rejîmê bifetisîne.

Çekdarbûna bajar tenê li Kurdistanê de nine belku herwekî em dibînin li ser erdê xuya dike, û li piraniya cihên din jî serî hildide û hekî rejîma Komara Îslamî tenê bi çek bersiva daxwaziyên xelkê û pirsên siyasî û neteweyî bide, pêşeroja Îranê di demeke gellek nêz de bajareke ser û bin çekdar dibe ku di nava şeqamên bajar de çeper tê lêdan.

**»»» Doma manşêtê**

Piştre Dr. Mîro Elyar endamê Navenda Siyasî ya Hizbê bi vê boneyê ve axavt. Navbirî di axavtinên xwe de îşare bi vê kir ku, tu gotin tê de nine derheq terorkirina Dr. Şerefkendî de, ku dijmin birîneke û valahiyeke kûr xiste ser cendekê Partiya Demokrat û derbeyeke giran li tevgera rizgarîxwazî ya Kurdistana Rojhilat xist, lê xwen û xelayên wê nehatin cî, û negihîşte hêviyên xwe. Îro 26 sal e piştî terora Berlînê, alaya xebata rizgarîxwazî ya me her wekî xwe ye, û ciwanên Şerefkendî destanrêsiyan diafirînên".

Di beşeke din a axavtinê xwe de, rêzdar Dr. Eliyar derheq kirîza ku îro Komara Îslamî digel de rûbirû ye, ragehand ku: "Komara Îslamî îro digel mezintirîn û metirsîdartirîn kirîza dîroka xwe ya navxwe û derve rûbirû bûye".

Derheq pêşhat û bûyer û ev siyasetên ku Kurd dibe bigrin pêş got: "Ji ber vê ku em li ser guherînkariyan de nekevin, yan jî guherînkarî bi ser me de neherifin, Kurd dibe amade be û xwe rêk bixîne da ku bikare bilez û di demên hewce de hewlên xwe bide, û ji derfetan bo qazanca neteweya xwe mifahê werbigire, û pîlan û gefên dijmanan pûç bike.Partiyên Kurdistanê rastî ceribandineke dîrokî hatine, û dibe berpirsane û siyasiyane gavan bavêjin". Herwisa got jî: "Yekbûn û yekhelwêstbûna Partiyên me, ne tenê li hemberî Komara Îslamî de hewce ye, belku rewş û pêgeha Kurd li hemberî opozisyona navendî li asta civaka navdewletî de jî bihêztir dike".

Piştî dawîn axavtinên rêzdar Mîro Eliyar, helbestek li jêr navê "Tehran hejiya" ji aliyê helbestvanê pêşmerge mamosta Bêbeş ve hate pêşkêşkirin, û herwisa di nîveka rêûresmê de jî, du stranên şoreşvanî ji aliyê hunermend Xulam Fatihî û Sîrwan Ehmedî ve hatin xwendin. Her di vê derheqê de di piraniya welatên Ewropayî û gellek cihên din ên cîhanê de merasimên taybet bi vê rojê hatin lidarxistin. Herwisa endam û alîgirên PDKÎ di gund û bajarên Kurdistana Rojhilat bi awayekî berfireh çalakiyên teblixî lidar xistin û rêz ji şehîdên xwe girtin û peymana wefadariyê digel wan nû kirin. Hêjayî basê ye ku deqa gotara Dr. Mîro Eliyar endamê Navenda Siyasî ya PDKÎ di vê derheqê de di rûpela 5 de hatiye çap û belavkirin.

# Mistefa Hicrî: Emê qonaxeke nû a xebatê li dijî rejîma Tehranê dest pê bikin




**Mistefa Hicrî lêpirsyarê giştî ê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê peyamek ji bo xelkê Rojhilatê Kurdistanê belav kir.**

**Peyam wiha ye;**

Welatiyên hêja!

Xelkê azadîxwaz ê Rojhilatê Kurdistanê!

Roja 17'ê Xermananê a 1397'an a Rojî (8'ê Îlonê a 2018'an a Zayînî), Komara Îslamî a Îranê, kampa xebatkarên Demokrat li rex bajarê Koyê li Başûrê Kurdistanê kire armanca mûşekan û di encam de mixabin dehan kes ji xebatkarên riya rizgariya welatê me hatin şehîd û birîndarkirin. Serê sibeha heman rojê, sê çalakvanên Kurd bi navên Ramîn Husênpenahî, Zanyar Muradî û Luqman Muradî, ku ev çend sal bûn di girtîgehê de bûn û xelk li benda azadbûna wan bû, li girtîgeha Recayî Şehr a Kerecê hatin darvekirin. Ji wê rojê ve ku Kurd pê hesiyane ku weke neteweyek, mafên wan hatine binpêkirin û ji bo standina wan mafan dest bi xebatê kirine, hertim di vê rewşê de derbas kirine. Herwisa dîroka tijî xwîn û qurbanîdanê a gelê Kurd li Kurdistana Îranê jî di nav xebata giştgir a Kurdan de li hemberî dagirkirin, tepisandin û tinekirinê reng vedide û dibirisqe. Lê belê rejîma Komara Îslamî ji bo tekmîlkirina zordarî û xwînrijiya xwe li hemberî gelê azadîxwaz ê Kurd, li gor îdiaya xwe ji Îslamê jî mifahê distîne ji bo ku rewatiyê bide tevahiya kiryarên hovane ên xwe li dijî neteweya me. Xwendin bi zimanê dayîkê ji bo me qedexe ye, çand û dîroka me bi derew tê guherandin, jîngeya me tevlîhev dikin û jîngeparêzên welatê me jî di parastina jîngeya xwe de serbest nînin.

Herwisa bilindtirîn rêjeya bêkariyê li parêzgehên Kurdistanê heye, yên ku ji ber birçîbûna jin û zarokên xwe hawara xwe dibin kolberiyê ji bo ku bi vî karê dijwar nanekî bidin malbatê, têne kuştin. Êdî her roj kolber li sînoran têne kuştin û rêjeya kuştina wan heya astekê bilind e ku ji bo xelkê dibin nûçeyên asayî ên rojane. Em di hemberî binpêkariya mafên xwe de ji wan daxwaza dabînkirina derfetên kar dikin, lê ew dibêjin hûn raya giştî a civakê dixapînin. Dema ku em dibêjin bila zarokên me bi zimanê dayîkê bixwînin, dibêjin hûn welat perçe dikin. Em dibêjin bihêlin bila nûnerên rastîn ên me civakê bi rê ve bibin, lê ew dibêjin hûn dijberên şoreşê ne û bi van tawanan me dixin girtîgehê, yan jî me ji axa xwe koçber dikin, me îşkence dikin, kerameta me dişkînin û me darve dikin. Cihê jiyana wan malbatan ku ji ber zulm û zordariyê reviyane, li welatekî din dikin armanca êrîşa mûşek û bombeyan.

Bi vî rengî li Kurdistana Îranê, derfet û mafê jiyanê ji bo Kurdan nema ye. Niha jî xelkê me bi navê derbasiya jiyanê, rezîlî û belengaziyê dibîne. Lewre divê em ji bo jiyaneke mirovî xebatê bikin. Em dev ji ti riyeke xebatê bernadin ji ber ku rejîmê ji bilî vê, ti riyek ji me re nêla ye. Ev rê ji xwe xuya ye ku pir dijwar e û bedêleke zêde jê re pêwîst e. Lê belê eger hemû bi hev re kar bikin û her kes li gor şiyana xwe kar bike û aliyekî xebatê bigire, wê demê dijwariyên vê rêyê kêmtir dibin û bedêleke kêmtir jî, jê re tê dayîn. Em weke Kurdên Rojhilat, divê bi xebata xwe bibin hêzeke xwedî bandor da ku rejîmên Tehranê nekarin û newêrin, bê tirs, jiyan û serweriya me zewt bikin, hesabê ji bo me nekin û me tine bikin.

Ev jî, heman peyama mirovî ye ku Rasana Rojhilat hildaye û we jî ev peyama rizgarker ji dil pejirandiye û mijûlî bicîkirina wê ne. Rejîm, ji bandora vê xebatê ditirse û lewma dest bi bikaranîna tevahiya şêwazên qirkirina Kurdan û jinavbirina wan dike. Êdî li ber çavên hemû dunyayê, bi mûşekan li kampa jin û zarokên penaberan li welatekî din dide û dixwaze bi vî awayî, dengê hemû Kurdan û dengê zarokên wêrek ên me qut bike û bêdengiyeke mîna goristanê, bi ser welatê me de ferz bike.

Renge niha deshilatdarên rejîma Îranê kêfxweş bin ku bi xeyala xwe karîne bi van mûşekbaranan, xebata Kurdan bidin sekinandin, û pişta xebatkarên Kurd çemandibin, lê Komara Îslamî baş bizane ku deshilatdarên berî wê jî li nêzîk bi sedsalên borî de, bi sedan carî Kurd komkuj kirine, û Kurdistan wêran kirine, û bi hezraan lawên têkoşer îdam kirine, û di girtîgehê de rizandine, û dahata welatê xwe talan kirine, lê bi vî halî jî ne tenê her nekarîne bêdengiyê bi ser Kurdistanê de zal bikin, belku rast berevajî roj bi rojê zêdetir xebata Kurd geşe kiriye, û bi dengeke bilindtir hawara mafxwaziya xwe bilind kiriye, lewra niha Kurdistan zêdetir ji her demî bi dengê bilind hawar dike, û heya serkut bihêztir be, dengê Kurd jî bilindtir dibe.

Rûyekî din ê vê pirsê ew e ku berevajiyê xwehilkişana rejîmê û aliyê piropagendeyî ya wê, ku hewl dide hemû şikestên xwe, ew jî bi serkevtin nîşanî xelk û cîhanê bide, li leyîza mûşekbarana kempa têkoşerên Rojhilat û îdama lawên Kurd li girtîgehan de, û vê piropagendeya berfireh ku bo vê kiryarê dike, dorandiyê serekî ye, jiber ku hemû ew hewlane îşareyê bi vê rastiyê dikin, ku Kurd bihêz e, û di vê demê de ku rejîm li nav dorpêçeke bikirîz de ye, ku bixwe ji xwe re çê kiriye, ne tenê tu riyek bo derbazbûnê tunîne, belku roj bi rojê kirîz zêdetir û roxînertir dibin.

Her lewra xebat û berêkaniya Kurd bo rejîmê cihê nîgeraniyê ye, jiber ku di heyama çil salên borî de, gellek carên din her wekî vê carê, bi bombebaran û zindanîkirin û îdamê nekariye Kurdan bêdeng bike. Bi taybet nîşandana hêz û morala xelkê qehreman û dilsojê Rojhilat, di warê pêşwaziya ji bangewaza hizbên siyasî ên xebatkar, rêkxiraw û çalakên medenî ku bi awayê girevgirtina sertaserî li Rojhilata Kurdistanê hemaseyeke nû afirandin, û bi nîşandana bêzariya xwe ji rejîma sêdareyê, hevsoziya xwe digel şehîdên 17`ê Xermananê li bajar û bajarokên Rojhilat nîşan dan. Herweha ew piştgirî, hevpêwendî û hevxebatiya ku Kurdên her çar perçeyên Kurdistanê li Başûr, welatên Ewropî, Amerîka û cihên din di warê eşkerekirina nerazîbûna xwe de, û mehkûmkirina îdama lawên Rojhilat û kiryarên cinayetkarane ên 17`ê xermananê, ew hêz û deng wekî bersiveke rohn û serfirazane ye bi rejîma Komara Îslamî ku Kurd bêdeng nabe, û ji xebatê nasekine. Di vir de ye ku xebata "çiya û bajar" pêkve tê girêdan. Aferîn û destxweş gelê serfiraz ê Kurdistana Îranê, dengê we bilindtir û morala we hesinîn be. Em jî wekî PDKÎ cardin peymanê nû dikin ku wekî dehan salên borî her ew dengê bilind yê we bin, ku kuştin, îdam û bombebaranên Tehranê em bihêztir kirine. Bêguman çavkaniya vê hêzê jî hûn in, em hemû bi hev re gellek bihêz in, hêzek ku pişta dijmin dilerizîne, û dixe qedeman.

Em bibawer in ku dest di nav destê hêzên siyasî ên têkoşer, lawên mafxwaz û hemû tex û çînên Kurdistana xweşdivî, ku baweriya wan bi rizgariya welat û neteweya xwe hene, di pêxema vê rizgariyê de pêngavan hilgirin, û qonaxeke nû ji xebata li dijî rejîma Tehranê bigrin pêşiya xwe, û heta bidestveanîna mafên xwe ên zewtkirî nesekinin. Bêguman serkevtin bo me ye, û rejîm jî ber bi nemanê diçe.

Di dawiyê de silavan dişînim bo riha pak ya şehîdên 17`ê Xermananê û sersaxiyê dibêjme malbatên wan ên ezîz û gelê Kurd bi giştî.

Herweha ez ji vê derfetê mifahê werdigrim, ku spasê bikim li hemû hizb û rêkxirawên siyasî û medenî, têkoşer û azadîxwazên Kurd di hemû beşên Kurdistanê di navxwe û dervey welat ku bi hemû şêweyekê hevxem û piştevanê me bûn, û digel me bûn.

# Deqa gotara Dr. Mîro endamê Navenda Siyasî ya PDKÎ di merasimê şehîdên Berlînê de

**Mêhvanên birêz, hevalên têkoşer, ew dema we baş!**

Roja 26`ê Xermanan a 1371`an (17.09.1992)`an wekî rojeke tal û cinayeteke bisam çûye nava dîroka bixwîn ya xebata neteweya me de.

Tewaw 26 salan berî niha Dr. Sadiq Şerefkendî sekreterê giştî ê wê demê yê PDKÎ û sê hevalên wî, kak Fetah Ebdulî nûnerê hizbê li dervey welat, Kak Homayon Erdelan nûnerê hizbê li Alman û herweha Nûrî Dêhkurdî çalakê siyasî û dostê PDKÎ li restorana Mîkonosê li Berlînê bûne qurbaniyê terorîzma dewletî ya rejîma Komara Îslamî ya Îranê û hatin şehîdkirin.

Îro em li vir kom bûne da ku rêzê bigrin ji bîreweriya vî rêberê hilkevtî û hevalên wî û em xebata wan tînin bîra xwe.

Hemû salê û li her derfetekê pêwîst e ku em bêzariya xwe ji terorîzmê bi giştî û ji van tawanên giran ên rejîmê ku li dijî Kurd encamp dane, eşkere bikin. Bo mirovê xebatkar û gelê rizgarîxwaz girîng e ku ne hevalên binirxên xwe ji bîr bike, û ne jî tawanên dijminê xwe ji bîr bike.
Ji aliyê rêbertiya PDKÎ ve, em bi germî bixêrhatina mêhvanên birêz dikim, û spas bo wan û bo we hevalên rêzdar ku hûn hatine vir, û di vê merasimê de beşdar bûn.

Hûn dizanin ku piştî vê ku mirovkujên rejîma Komara Îslamî di sala 1989`an (1368) de, Li Viyenê rêberê mezin Dr. Qasimo teror kirin, Dr. Sadiq Şerefkendî ku di nav me de bi Dr. Se`îd hatibû nasîn, rêbertiya PDKÎ girte destê emîn û bihêz ê xwe, û nehêla alaya xebata rizgarîxwaziya hizba me bo bîstekê jî ser erdê bimîne, û bi vî rengî dijminê xwînmij tûre û nerehet kir.

Berevajiyê çavnihêriya rejîmê, PDKÎ li jêr barê giran ê jidestçûna Qasimloyê nemir de pişta wî neçemiya, û bi rêbertiya Dr. Sadiqê jêhatî dirêjî da xebat û rêbaza neteweyî ya xwe.

Dijminê perîşan dema ku dît ku pîlana wê ser negirt, û hêviyên




wî nehatin cih, biryara jinavbirina Dr. Şerefkendî da, û kete nav pilandarêtina terorkirina wî. Axavtin tê de nîne, ku bi terorkirina Dr. Şerefkendî dijmin birîneke bijan û valahiyeke kûr xiste ser laşê PDKÎ û derbeke giran li tevgera rizgarîxwaza li Rojhilata Kurdistanê weşand, lê xewna wê ser negirt, û negihîşte hêviyên xwe. Îrorojê 26 salan piştî terora Berlînê, alaya xebata rizgarîxwaziya me her wa pêlan dide, û xortên Şerefkendî hemaseyan diafirînin.

Bi terora Mîkonosê Komara Îslamî perde li ser rûyê nizama xwe vêde da, û cewherê dijî Kurdbûna xwe zêdetir bi neteweya xwe da nasandin, û bi taybetî ciwa hişyar û serwext kirin, hesta neteweyî û bîra rizgarîxwaziyê tê de bihêztir kirin, û baweriya Kurd bi hikûmeta Îslamî ya Îran binax kir.

Di asta navneteweyî û bîrûraya giştî de, hukmê dadgeha Birlînê ku bi dadgeha Mîkonosê hatiye naskirin, û li rêkewt 10`ê Nîsana 1997 (21`ê Xakelêweya 1376) an de hate ragehandin, terorîzma dewletî ya rejîma Îranê eşkere kir, û bi eşkere rêberên rejîma Îranê di asta herî bilind ya hikûmetî de wekî pilandarêj û birêveberê terorîzmê bi cîhanê da nasandin. Ji hukmê dadgeha Mîkonosê ve heya niha jî mohra terorîzmê ser eniya rejîmê ye, û lê jê nabe.

**Rêzdarno!**

Dr. Şerefkendî rêberekî siyasî bû û di pêxema bîr û bawerî û armanceke siyasî de serê xwe danî, lewra ciyê xwe de ye di salvegera terorkirina wî de, em awirekê bidin rewşa niha ya Komara Îslamî, ku bi hêviya fetisandina dengê azadîxwaziyê û nehêlana hesta xebat û berxwedana Kurdê Rojhilat, kak Sadiq teror kir.

Komara Îslamî îrorojê digel mezintirîn û pirrmetirsîdartirîn kirîza dîroka xwe li navxwe û li derve de berbirû ye. Kirîza îro hemû aliyên sîstemê bi xwe ve girtiye:

-Kirîza siyasî û kirîza deshilatdariyê: Kêşeyên Komara Îslamî hekî di detspêkê de, xwe di bêbernameyî, kêşeya mudîriyetê, dizî, û gendeliya bêsînor ya hakimiyetê de didît, hêdî-hêdî jidestdayîna rewayiya hikûmetî lê ket. Niha ji vê qonaxê jî derbaz bûye û rejîm rastî kirîza hakimiyetê hatiye. Kirîza serweriyê (hakimiyetê) bi vê watayê ku valahiyeke kûr xiste nav xelkê û hikûmetê, ku rejîmê şiyana tejîkirina wê nîne. Îdeolojî û bingehên hizrî û otorîteya siyasî ya hikûmetê kal bûye, û şiyana qani`ikirin û xistine hereketê ya civakê bo armancên deshiatê nemaye. Wek dibêjin hikûmetê deshilata siyasî ya xwe ya bi ser xelkê de dorandiye, û bona aramkirin yan bersivdana bi daxwaziyên xelkê, tenê du tişt pê mane: Derev û qewlên nerast û bê `emel, û hawarbirina bo tundûtîjî û serkutê.

Di encama van kirîzên hemû aliyane de, tevlihevî û eşkerekirina nepeniyên (nihêniyên) hevdu, û dubendî û netebahiya navxweyî ya deshilatdariyê berdewam kûrtir û eşkeretir dibe.

-Kirîza aborî û civakî: Di encama şepirzeyiya aborî, û daketina diravê welat, giraniya rojbirojê, û carna heta demjimêr bi demjimêr, bêkarî û destengî bi awayekî ecêb zêde bûye.

Revîna kompaniya û sermayeguzarên biyanî li Îranê, aboriya şepirze ya welat gehandiye ser lêva herifîna yekcarî. Rêberên rejîmê her kesê di fikra talankirina welat û birina bo derve ya samana xwe ye.

Giranî û bêkarî û hejarî ji aliyekî ve, û bêçareyiya rejîmê di warê dabînkirina hewcehiyên herî destpêkî ên xelkê ji aliyekî din ve, civaka Îranî tûşî kirîzên bêmînak ên civakî kirine.

-Kirîz di siyaseta derve de; Di siyaseta derve de, bi sedema hewldan bona bidestveanîna çekên komkuj, pêdagirî li ser domandina bernameyên mûşekên balistîk, berçavgirtina siyaseta destêwerdan û tevdanîkariyan û nearamkirina welatên herêmê, tewaw îzole bûye. Bi gotina Ayetullah Mihemed Tqî Misbah Yezdî di roja 14`ê Xermananê de, Komara Îslamî di cîhanê de bi qasî tiliyên destên jî dost nînin.

Di rastî de, yek ji wan sedeman ku rejîm ketiye ber dorpêçan û

cezayên navnetewyeî, terorîzm û piştevaniya bi eşkere ji terorîzmê ye. Bi hemû pîvanên selimandî, Komara Îslamî li warê siyasî, aborî, û exlaqî de rejîmeke têkçûyî ye. Derheq Kurdistanê de, em dizanin ku siyaseta Komara Îslamî li dijî Kurd di hemû biyavên xwe de, bi tundî berdewam dike.

Dawî mînaka vê siyasetê, bûyera 17`ê Xermanana 1397`an bû ku rejîmê destpêkê sê lawên Kurd îdam kirin, û piştre binkeyên xebatkarên Demokrat li Koye dane ber mûşekan, ku bû sedema şehîdkirina 15 kesan û birîndarbûna nêzî 40 kesan. Komara Îslamî bi vî karê cinayetkarane cinayeteke din li dijî Kurd afirand. Du rojan piştre laweke din bi navê Kemal Ehmedînijad îdam kir. Ew êrîş bi armanca neçarkirina hizban bo ragirtina xebatê bi rê ve çû. Siyaseta PDKÎ di vê derheqê de zelal e: Ragirtina xebatê bo me cihê baskirin û pirsyarkirinê nîne. Sê sal in hizba me xebateke nû dest pê kiriye, û di siberojê de jî bi her şêweyekê ku bi baş bizane, dirêjiyê bide xebata xwe li dijî Komara Îslamî, di pêxema dabînkirina mafên rewa ên gelê me de.

Cinayeta 17`ê Xermananê yekem cinayeta Komara Îslamî li dijî Kurd nebû. Rejîm nêzî 40 salan e ku bi hemû şêweyekê siyaseta serkut û jinavbirina Kurd bi rê ve dibe, nekariye Kurd bixe qedeman.

Ew cinayet, me li ser xebata li dijî dîktatoriyê û tekoşîna me bo bidestveanîna armancên me pêdagirtir dike. Jan û xema jidestdana hevsengerên xwe, em dikin moral û bi îrade ve, em berdibin canê dijmin, û vê yekê em dikin hêvinê yekgirtinê bo berdewamiya xebata di pêxema rizgarîiya ji bindestiyê. Em bibawer in ku nirxa gihîştina bi rizgarî û azadiyê bidin, û ew cinayet nikarin pêngavên me sist bikin. Bersiva xelkê Kurdistanê di roja 21`ê Xermananê (12`ê Îlonê) bi bangewaza Navenda Hevkariyê ya Hizbên Kurdistana Îranê û rêkxirawên medenî û girevgirtina wan bi vê berfirehiyê, hemase û peyameke zelal bû bo Komara Îslamî.

Mûşekbarana 17'ê Xermananê bû sedem da ku xelkê Kurdistanê û Komara Îslamî, hevrikiyê bikin û her yek ji wan, xwe biceribîne. Ev jî di demekê de bû ku rejîmê hesaba xelkê nekiribû û li bendê nebû ku xelkê ti karvedanek hebe.

Lê xelkê Kurdistanê dîsa jî nîşanî cîhanê da ku berovajî îdiayên Komara Îslamî û dujminên din, pirsa Kurd li Îranê heye û nayê înkarkirin. Ev pirs li Îranê, pirsa yek yan çend partiyên siyasî nîne. Pirsa neteweyeke zîndî û hişyar e ku ji bo azadiyê û dabînkirina mafên netewî, amade ye qurbaniyê bide.

Bersiva xelkê, ewqasî xurt bû ku hikûmet perîşe kir. Piştî hemaseya 21'ê Xermananê, eger hezar kesên din jî, ji me bêne kuştin, lê dîsa jî rejîm di hevrikiyê de sernakeve.

Di vê derbarê de roja 24'ê Xermananê, Mihemedhusên Recebî fermandarê Spaha Pasdaran a parêzgeha Sine, ji ber ku xelkê Kurdistanê girev girtibûn û dukan û bazar girtibûn, gefa tolhildanê li wan xwar! Rast e ku dîktator dersê ji dîroka xwe nagirin.

Gelo hûn çima gefan dixwen?! Di çil salên temenê rejîma we de, kîjan tawan maye ku hûn li hemberî netewa Kurd pêk neynin û niha jî gefan dixwen?!

Ev çil sal in hûn dikujin, ser jê dikin û rêberên me teror dikin, xortên me darve dikin, rehma we bi kolberên zehmetkêş ên Kurd û jin û zarokên wan nayê, Ev çil sal in hûn bi hemû şiyana xwe hewl didin xelkê Kurdistanê ji partiyên Kurdî veqetin, gelo hûn gihîştin armanca xwe?!

Ji xwe xuya ye ku rejîmeke dagirkar û dijî mirovahiyê a weke Komara Îslamî ku xwediyê tank, top, mûşek û balafiran e, ji bo kuştina Kurdan, ti astengiyeke exlaqî û mirovî di xwe de nabîne û dikare bikuje û wêran bike. Lê belê hûn çil sal in vî karî dikin, gelo hûn tenê gavekê li armancên xwe nêzîk bûne. Para we tenê têkçûn, rûreşî û berdewamkirina tawanan bûye.

Mûşekbarana 17'ê Xermananê, bi ti awayekî nîşanderê hêz û desthilatdariya Komara Îslamî nebû. Vê êrîşê, lawazbûn, damayîbûn û bi taybet tirsa rejîmê ji berfirehbûna tevgera Kurdan û ajarvedana wê ji bo navçeyên neteweyên din ên bindest li Îranê bû.

Ev êrîş ji bo tirsandina xelkê nerazî ê Îranê û xapandina raya giştî derbarê kirîzên navxweyî de hate kirin.

**Rêzdarno!**

Êdî derket holê ku bibandortirîn bersiv û bijantirîn tolhildana vê karesatê bi hevgirtin û xebata hevpar tê kirin. Rejîm ji her tiştî zêdetir ji yekîtî û hevhelwestiya hêzên siyasî ên Kurdî ditirse. Ditirse ku partiyên Kurdî û xelk, bi hêzeke hevgirtî li hemberî dîktatoriya Komara Îslamî derkevin.

Remza serketina xebata rizgarîxwazî a neteweyeke bê welat, di yekîtî, hevpeymanî û hevgirtinê de ye. Dagirkar ji hevhelwestiya gelê tepisandî ditirse.

Di vir de dixwazim weke rêberatiya PDKÎ, careke din silavê bidim xelkê hişyar ê Kurdistanê û ji wan re bêjim em bi we serbilind in û şanaziyê dikin ku xortên we ne.

Hevalno!

Eger rejîma Komara Îslamî, bi her awayekî bixwaze li hemberî vê rewşa tijî kirîz derkeve, pêşerojeke zelal jê re namîne. Êdî divê em li Îranê li benda guhertinan bin.

Lê guhertin, eger têkçûna rejîmê bi rengekî utumatîk be, nayê wateya nemana dîktator û dabînkirina mafên me. Di şoreşa berê de, dema ku rejîma Şah têk çû, ev ji bo me derket holê.

Ji bo ku em bi ser guhertinan de neçin yan jî guhertin nekevin ser serê me, divê Kurd amade bin û xwe rêkxistinî bikin. Divê em bikarin di dema xwe de bi awayekî lezgîn, di berjewendiya netewa xwe de mifahê ji derfetan bistînin û pîlan û gefên dujminan têk bibin. Partiyên Kurdistanî, rastî ezmûn û taqîkariyeke dîrokî tên. Lewre jî divê berpirsane û bi rengekî siyasiyane gavan bavêjin.

Pêşeroja xebata me zelal e. Di nav partiyên Rojhilat de jî guhertin û tevgereke nû li navxwe û dervey welat tê dîtin.

Ev guhertin, mizgîniya serhildana bawerî û hizrên nû di xebata netewî de lixwe digirin. Mirov pê dihese ku êdî ji bo tevgeran li Rojhilatê Kurdistanê, stratejiyeke nû pêwîst e.

Bingeha vê têgeh û qenaeta nû di nav partiyên Kurdî de ev e ku em bi hevkarî, hevgirtîbûn û danîna bernameyeke siyasî a rastbîn, dikarin bi ser kêmasiyên tevgera xwe de serkevin.

Em divê van bawerî û qenaetan bikin bingeha stratejiya nû a ji bo vejandin û berfirehkirina xebatê li Rojhilatê Kurdistanê.

Tevî ku derfet ji bo Kurdan derketine, gefên li hemberî wan jî zêde bûne. Bi taybet ku heya wê demê ku nizama mezhebî-nasyonalîstî a Komara Îslamî dimîne, dev ji dujminiya Kurdan bernade û wê di tepisandina Kurdan de û danîna pîlanan li dijî wan li her çar beşên Kurdistanê berdewam be.

Ji ber vê, divê mifahstandin ji derfet û fersendan û lihemberderketina gefan û têkbirina pîlanên dujmin, bibe armanca stratejîk a tevgerê û divê hevkarî, xebata hevpar, hevgirtîbûna xelkê û partiyên Kurdî jî xurttir bibe.

Serketina xebata netewî a rizgarîxwaz, girêdayî yekîtî, beşdariya hevgirtî a hêzên nava tevgerê û hevxebatiya wan di rewşeke demokratîk de ye.

Di vê pêwendiyê de pêkanîna "Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistana Îranê" weke gava destpêkê ji bo armanceke bicî, gelek bicî bû. Lê belê ji bo ku bigihêje armanca xwe, divê çalaktir be. Lewma bicîkirina van xalan tê de gelek girîng û pêwîst e.

Yekîtî û hevhelwestiya partiyên me li hemberî Komara Îslamî ne tenê heyatî ye, lê belê cî û pêgeha Kurdan li hemberî opozîsyona navendî û di asta civaka navdewletî de jî xurt dike. Van pirsan jî bi rengekî rasterast pêwendî bi hev re hene.


Bilind û pîroz be bîranîna rêberê me ê jêhatî, Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî, kek Fetah Ebdulî, kek Humayûn Erdelan û kek Nûrî Dêhkurdî.

Silav li canê paqij ê şehîdên PDKÎ û riya rizgariya Kurdistanê û bi taybet şehîdên 17'ê Xermananê

Berdewam be xebata PDKÎ di pêxema dabînkirina armancên netewî û demokratîk de

**Hûn jî sax, serbest û serkeftî bin**

## Nerîna Lîderan



Mistefa Hicrî:

“Amerîka mijûl e Îranê lawaz dike, ew yek jî bo me girîng e”.



Barzanî:

“Arîşe û pirsgirêkên gelê Kurd bi tund û tîjî û kûştin û bomberankirinê nayên çareserkirinu”.

Mistefa Hicrî: Amerîka mijûl e Îranê



Benjamin Netanyahu:

“Welatên din dibe rêz ji hêlên sor yên Îsra`îlê bigirin”.



Nikki Haley:

“Rejîma Îranê êrîşa mûşekî kire PDKÎ, ew yek cihê qebûlkirinê nîne”.

# “Marco Rubio”: Hewce ye ku Amerîka li hemberî êrîşa mûşekî ya bo ser binke û baragehên Partiya Demokrat helwêstê bigire

**Senatorekî Komarîxwaz yê Amerîkayê yê li Senaya wî welatî deê êrîşa mûşekî ya Spaha Pasdaran ya bo ser binke û baregehên Partiya Demokrat beşek ji hewlên rejîma Îranê bo nearamkirina deverê da zanîn û daxwaz ji welatê xwe kir da ku li hemberî vê kiryara rejîmê de helwêsta micid hebe.**

Senator “Marco Rubio” yek ji endamê payebilind yê Senaya Amerîkayê ye, di “twitt”a xwe de êrîşa mûşekî ya Spaha Pasdaran ya bo ser binke û baragehên Partiya Demokrat şermezar kir, û daxwaza bersivdaneke tund û micid ji aliyê Amerîkayê ve derheq vê êrîşa Komara Îslamî ya Îranê kir.

Navbirî got ku: Ev hewla rejîma Îranê beşek ji hewlên vê hikûmetê ne, ji bo afirandin alozî û têkdana ewlehiya deverê û kiriyareke terorîstî ye.

Roja Şemî rêkefta 17`ê Xermananê (8`ê Îlonê) binke û baregehên Partiya Demokrat yên li bajarê Koyê di kûrhiya axa Herêma Kurdistanê de, ji aliyê Spaha Pasdaran a rejîma Îranê, hatine bombebarankirin, ku di vê bombebaranê de hejmareke xuya ji xebatkarên riya azadiyê şehîd û birîndar bûn.




Her piştî vê cinayeta şermokane ya rejîmê, gelê Kurd di Kurdistana Rojhilat de, bi yekdengî û yekhelwêstî ber bi pêşwaziya ji bangeşeya Partiyên Kurdistanê hatin û gireveke seranserî di Kurdistanê de rêk xistin ku, bersiveke dîrokî bû, ji desthilatdarên nerewa yên komara Îslamî re.

Di heyama çend rojan berî niha de jî, dewleta Birîtaniyayê, di daxuyanyekê de bi awayê fermî û bi tundî êrîşa mûşekî ya Spaha Pasdaran ya rejîma Îranê ya bo ser binke û baregehên Partiya Demokrat şermezar kir.

Ji aliyekî din ve balyozê Birîtaniyayê yê li Îraqê jî, êrîşa mûşekî ya Sapah Pasdaran ya bo ser binke û baregehên Partiya Demokrat şermezar kir, û di civîneke rojnamevanî de ragehand ku: “Armanca rejîma Îranê di vê êrîşê de kuştina xelkê sivîl bûye, ku bi tu awayî nayê erêkirin, û herçend ku her welatekî mafê parastina xwe heye lê, ev kiryara rejîma Îranê berevanîkirin nebûye, belku êrîşeke eşkere bûye bo ser welateke din, navbirî îşare bi vê jî kiriye ku rejîma Îranê rêz ji serweriya Îraqê negirtiye, û em gihîştine bi vê encamê ku ev êrîşa gellek metirsîdare û rewşa deverê aloz dike”.

# Komela Mafê Mirovan a Kurdistana Îranê-“Geneva” li NY de, bombebarana binke û baregehên Partiya Demokrat şermezar kir

**Komela Mafê Mirovan a Kurdistana Îran “Geneva”êdi gotarekê de li 39.mîn civîna Şêvra Mafê Mirovan a NY de, êrîşa mûşekî ya komara Îslamî ya Îranê ya bo ser binke û baregehên Partiya Demokrat şermezar kir, û daxwaz ji NY û komela navneteweyî kir ku rejîma Îranê şermezar bikin.**



Deqa gotarê wiha ye:

Rêzdar serok!

Di destpêkê de, Komela Mafê Mirovan a Kurdistana Îranê -“Geneva”ê, pêşwazî ji raporta şivêrmendê taybet yê sekreterê giştî yê NY ji bo piştevanîkirin ji jînosayd û komkujiyê dike. Komela Mafê Mirovana Kurdistana Îranê- “Geneva”, bala we ji bo ser destdirêjî û êrîşa mûşekî ya Komara Îslamî ya Îranê bo ser binke û baregehên hêzên siyasî yên Kurdistana Rojhilat û kempên penaberan yên nêzîkî bajarê Koyê li Kurdistana Başûr radikêşe.

Li rêkefta 8`ê Îlona 2018`an, komara Îslamî ya Îranê, di êrîşeke mûşekên dûrhavêj de, bo ser binke û baregerehên hêzên siyasî yên Kurdistana Rojhilat û kempên penaberan yên nêzîkî bajarê Koyê li Kurdistna Başûr de, 17 kes teror û zêdeyî 40 kesên din jî birîndar kirin.

Herwisa rojek berî vê bûyerê jî, li rêkefta 7`ê Îlona 2018`an, hêzên Spaha Pasdaran, bi topbarankirina giran ya bo ser sînorên deverên Biradost û Sîdekan, zirareke zêde ji ber kesên xwedîpez û çandiniyê ê xelkê sivîl yên van deveran gihand.

Destdirêjî û kempêyna terora komara Îslamî ya Îranê bo ser Kurdistana Başûr û, topbarankirina korkorane ya gundên ser sînor û kempên penaberan li bajarê Koyê, binpêkirina eşkere ya yasaya navneteweyî û konvansyonên “Geneva”ê ye.

Di dawiyê de, daxwaz dikin ji Şêvra Mafê Mirovan û Komela Navneteweyî, ku êrîşa komara Îslamî şermezar bike, û divê derheqê de komîsyoneke vekolînê pêk bîne.

**Komela Mafê Mirovan a Kurdistana Îranê- “Geneva”**

**17`ê Îlona 2018`an**

# PDKÎ li ser domandina “Rasan”ê pêdagirî kir

Civîna hevbeş ya Navenda Siyasî û Desteya Kargêrî ya PDKÎ dawî pê hat, û daxuyaniyek di vê derheqê de hate belavkirin.

Deqa daxuyaniyê:

Em bi agehdariya hemû aliyekî radigehînin ku demjimêr 9`ê sibezûya roja Pêncşemiyê 22`ê Xermananê (13.09.2018)`an civîna hevbeşa ya Navenda Siyasî ya PDKÎ û Desteya Kargêrî ya PDKÎ pêk hat.

Civîn bi ragirtina bîstekê bêdengî û rawestiyan ji bo rêzgirtina ji şehîdên Rasana Rojhilat û şehîdên 17`ê Xermananê, ên ku li encama mûşekbarana binke û baregehên Hizba Demokrat de canê xwe ji dest dan, û ji bo rêzgirtina ji şehîdên riya rizgariya Kurdistanê dest pê kir.

Piştre Lêpirsyarê Giştî ê PDKÎ Mistefa Hicrî tevî bixêrhatinkirina beşdarên civînê, baseke siyasî li ser rewşa Îran û Kurdistanê û kar û çalakiyên PDKÎ û pîlanên rejîma Îranê, û wan kirîzên curbicur ku digel de rûbirû ye, pêşkêşî beşdarên civînê kir.

Ew bas û mijar bi hûrî û bi waqi`ibînî ve ketin ber boçûna beşdarên civînê, û bi têbîniyên xwe, aliyên cur bi cur ên vê pirsê gengeşe kirin.

Di encam de komeke helwest û biryar û rasiparde lê ketin, ku rêberiya hizbê erkdar kir, bona birêvebirin û encamdana wan. Di vê çarçoveyê de, civînê pêdagirî kir li ser domandin û geşepêdana Rasana Rojhilat di warên cur bi cur de, û di vê derheqê de spas û pêzanîna beşdarên civînê li hemû wan têkoşeran û xelkê Kurdistanê hate kirin, ku di vê piroseya girîng de erk û wezîfeya siyasî û niştimanî ya xwe gehandin encamê.

Civîna hevpar ya Navenda Siyasî û Desteya Kargêrî ya hizbê awirek da rêkxistina organên hizbê li gora qewareya nû ya hizbê, û rêûşûnên hewce bo berpirsan û organên pêwendîdar diyarî kir, da ku di piratîkê de cîbicî bikin. Civînê bi girîngiyeke tewaw ve hûrdekariyên mûşekbarana binke û baregehên PDKÎ ji aliyê rejîma Îranê ve behs û gengeşe kir, û ew




cure kiryarên rejîmê bi nîşaneya tirsa tewaw ya rejîmê ji tevgera Kurdistanê û bandordariya PDKÎ li ser rewta vê tevgerê da zanîn, û li ser vê baweriyê bû, ku serbarê şehîdbûna desteyek ji têkoşerên Demokrat ku cihê dilgiraniya me hemiyan bû, lê vê êrîşê îradeya xebata li dijî rejîma Komara Îslamî bihêztir û bigurrtir kir. Di heman demê de sersaxî gote hemû hevsengeran û malbatan û hevalan û bi giştî camawerê xelkê Kurdistanê, û xatircemî da ku xwîn û xebata van şehîdan li pêxema azadiya niştiman de heder û xisar naçe.

Derheq vê mûşekbaranê de, Navenda Hevkariya Hizbên Kurdistana Îranê û hejmarek ji hêz û aliyên din bi yekdengiyeke giştî bang li xelkê Kurdistanê kirin ku bi armanca mehkûmkirina Komara Îslamî ya Îranê derheq mûşekbarana binke û baregehên hizbê, û îdama komek ji xortên Kurd helwestê bigrin, û di herekete bikom û neteweyî de cardin erk û wezîfeya xwe ya niştimanî bi cî bînin.

Bi xweşî ve xelkê xebatkar û xweragir ê Kurdistanê tevî hemû gefên Komara Îslamî ya Îranê, û hêzên serkutkar ên xwe, bi awayekî berfireh pêşwazî kirin ji vê girevê, û nîşanî rejîmê dan, ku wekî hertim piştevanê tevgera rewa ya xwe ne, û li ser dabînbûna maf û azadiyan pêdagir in û emegdariya xwe bo şehîdan dubare kirin.

Lewra civînê bi ew qasê emegnasî ve, li vê helwesta neteweyî û niştimanî ya xelkê xebatkar û xweragir ê Kurdistanê nihêrî, û spasiya xwe pêşkêşî vî xelkê emegnas û têkoşer kir.

Di vê derheqê de civînê bi girîngî ve li vê yekgirtina hizb û aliyên siyasî ên Kurdistanî nihêrî, û nîşan da ku yekgirtina van hizb û aliyan li warê pêşwaziya xelkê Kurdistanê ji daxwazên me dikare hêzeke nû û girîng bide tevgera Kurd di Kurdistana Rojhilat, û di heman demê de, vê peyamê jî bide hikûmeta Komara Îslamî, ku di Kurdistanê de xwediyê çi pêgeheke siyasî û civakî nine, û nikare bi derba zor û girtin û îdamê, vî xelkê xweragir çavtirsandî bike, û ji daxwazên wê yên rewa paşve vegerîne.

Girîngiya vê yekgirtinê û bandorên wê, civîn anî ser vê baweriyê ku di pêşerojê de, zêdetir bo vegeşandina vê hevkarî û hevxebatiyê pêngavan hilgire, û zêdetir ji berê vegeşîne.

Civînê bi baldan bi helwest û eşkerekirina ramanan, û mehkûmkirina mûşekbarana binke û baregehên PDKÎ ji aliyê dewletan, parlemanteran, hizb û aliyên siyasî, NGO,hizb û aliyên siyasî ên her çar perçeyên Kurdistanê, û kom û civatên navdewletî û kesayetiyên Kurd, Îranî, û biyanî, spasiya hemû aliyekî kir, ku erk û wezîfeya xwe ya mirovî bi cih anîne.

Civînê spasiya xwe ya taybet ji hemû xelkê bişeref û dilsoj ê bajarê Koyê û berpirsên hizbî û hikûmî ên vî bajarê xweşdivî kir, ku di pêvajoya vê bûyerê de, ew qasê hevakriya xwe nîşan dan, û bi hawara malbatên Kurd ên Rojhilat ve hatin.

Bi liberçavgirtina hemû wan helwest û dilsozî nîşandana bo têkoşerên Demokrat û tevgera Kurd di Kurdistana Rojhilat de, bi taybetî ew piştevanî û helwestgirtina civatên xelkê Kurdistana Rojhilat, civîn xatircem bû ku vê mûşekbaranê, ji bilî şermezariyê nekarî tu tişteke din bo rejîmê li pey xwe bîne, bi taybetî ku ew cure hereketên rejîmê, ne tenê di pêvajoya xebatê de, pêngavên xortên Kurd û têkoşerên Demokrat şil nake, belku wan li ser berdewamiya xebatê li hemû şikl û şêweyên xwe de, li dijî rejîmê pêdagirtir û biîradetir dike.

**Nivîsîngeha Desteya Kargêrî PDKÎ**
**23.06.1397**
**14.09.2018**





## Hejmara Kedkarên Karxaneya Nesacî ji 7 hezarî bo 300 kedkarî kêm kiriye

**Berpiresekî Karxaneya Nesacî ya bajarê Mazenderanê daye xuyakirin ku kedkarên ku di vê karxaneyê kar dikin, hejmara wan li 7hezar kesî bo 300 kesî kêm kiriye.**

Nesrulah Derya Bêygî berpirsê Kargêrî yê "Xanêyê Karger" yê Parêzgeha Mazenderanê di gotûbêjekê de, daye eşkerekirin ku, niha hejmara kadkarên ku di karxaneya Nesacî ya Mazenderanê de mejûl in 310 kes in, eva tê vê wateyê ku, ji 7hezar kesî berî şoreşê, em niha gihîştine bi 300 kesî.

Navbirî ev yeka jî zêde kir ku, li pêş şoreşê de, 3 karxaneyên bi navên "Nesaciya Mazenderanê kar dikirin, lê niha ev hatine daxistin û erdê van jî aliyê şaredariyê ve ji bo firotinê hatiye parçekirin, û tenê nesaciya "Têlar" maye û ev jî li rewşekê de ye ku berpirsayetiya vê nediyar e.

Nesirullah Derya Bêygî berpirsê Kargêrî yê "Xanêyê Karger" ya Parêzgeha Mazenderanê, bi rexnegirtin ji çavaniya birêvebirina vê karxaneyê sedema serekî ya pisrgirêkên betalbûna kedkarên vê karxaneyê daye zanîn, ku niha kes ji bo encamadana karûbarên îdarî nehatiye destnîşankirin.



Herwisa navbirî got ku di vê parêzgehê de derfetên kar tunînin û Nesaciya Mazenderanê karxaneyek bû ku tevahiya kedkarên vê deverê wir kar dikirin.

Wî berpirsî, derheq birêvebirina vê karxaneyê ji Nûçegihaniya "Tensîm" re ragehandiye ku, li dehikên borî heya niha, Karxaneya Nesacî ya Mazenderanê gellek baş bo çi li pêş şoreşê çi jî piştî şoreşê, û ev karxaneya ji çendîn beşên cuda wekî, Nesaciya Têlar, Tebersitan û çêkirina Telîsan pêk hatibû.

Derya Bêygî, berpirsê Kargêrî yê vê karxaneyê dawiyî de ev yeka jî daye eşekerekirin ku, di vê rewşa aborî ya welat de Kedkarên vê karxaneyê ev 4 meh in ku perê xwe wernegirtine, û navbirî got ku dewlet dibe dest bi kare be di vê derheqê de, û hukimraniya xwe bi kar bîne, ne ku erdê vê karxaneyê parçe parçe ke û bifiroşe.

## Çûna torîstan bo Îranê %40 kêm kiriye

**Serokê Komîsyona Torîzmê ragehandie: %40 ji torên derekî ku dihatin Îranê, sefera xwe ya bo Îranê hilweşandine**.

Serokê Komîsyona Torîzmê ya Odeya Bazerganiya parêzgeha Kirmanê ragehand: Piraniya firînên derekî hatine hilweşandin, û nirxa firînên navxweyî jî zêde bûne.

Li gora raporan, Mêhdî Siyaweşî Serokê Komîsyona Torîzmê ya Odeya Bazerganiya parêzgeha Kirmanê di kombûna hevpar ya heyeta serokatiya odeya bazerganiyê, û şêvra bilind ya bankan digel civata nûnerên parêzgehê got: %40 ji torên derekî ku dihatin Îranê serdana xwe bo Îranê hilweşandine, û herweha piraniya firînên derekî hatine hilweşandin, û nirxa firînên navxweyî jî yan hatine hilweşandin, û nirxa firînên navxweyî jî zêde kirine, lewra çûna torîstan bo welat kêm kiriye.



Navbirî herwisa ragehand ku piraniya wan torîstên ku têne parêzgeha Kirmanê Firansewî ne, ragehand: Parêzgeha Kirmanê hewcehiya wê heye bi hebûna firîneke navneteweyî ya rasterast û firîna bo navenda parêzgehan.

Bêguman di demekê de ku rewşa aboriya welat bi sedema siyasetên têkderane û birêveberiya şaş roj bi rojê xiraptir dibe, torîzm dikare roleke mezin di geşeya aborî de bilîze. Lê her ew rewşa xirab ya siyasî û nerazîbûnên berdewam û normalnebûna civakê, bandor li ser lawaziya pîşeya torîzmê dike.

## Gireva seranser ya Kurdistanê di medyayên cîhanî de deng veda

**Navendên Nûçegihanî û medyayên cîhanî, bi giringî ve bas ji girevigirtina seranserî ya Kurdistanê dikin.**

Piraniya nûçegihan û medyayên cîhanî di raportên cuda de bas ji dengdaneveya gireva seranserî ya Kurdistanê ya li roja Çarşemî rêkefta 21`ê Xermananê (12`ê Îlonê) dikin.

Ev nûçegihanî û medyayên cîhanî bi belavkirina wêne û komek twit ên, ku ji aliyê xelkê ve ji bo van hatine şandin, di rûpelên fermî yên xwe de bas ji dengdaneveya vê girevê dikin, ji bo mînak: Nûçegihaniya "Dengî Amerîka", "BBC", "Radio Zamaneh", "Radio Farda", "DW", û KAYHAN LONDON…hwd.

Roja Çarşemî rêkefta 21`ê Xermananê (12`ê Îlonê) xelkê Kurdistanê bi pêşwazkirina li bangeşeya Navenda Hevkariyê ya Partiyên Kurdistana Îranê hatin, û di gireva seranserî ya di bajarên Kurdistanê de bi armanca dubare "Ne"gotin ji rejîma Îslamî ya terorîst a Îranê re, û di bin silogana kempêyîna "li malê dernakevim heya kirameta neteweya xwe biparêzim" girev girtin. Xelkê bajarên Kurdistana Rojhilat, ji bo nîşandana nerazîbûna xwe li hemberî bidarvekirina 3 girtiyên siyasî yên Kurd yên bi navên "Zanyar û Luqman Muradî" û "Ramîn Husênpenahî" di girtîgeha Recayî Şehr a bajarê Kerecê, û hevdem çend demjmêran piştî wê, êrîşa mûşekî ya bo ser binke û baregeh û kemp û cihê akincîbûna malbatên pêşmergeyên Partiya Demokrat ku, şehîdbûna 15 kesî û birîndarbûna aliyê kêm 40 kesên din li pey hebûye, û bi darxistina deriyê dukan û bazaran û herwisa bi derketina li malên xwe, dest bi gireva seranserî kirin.

Girevigirtina seranserî ya Kurdistanê, ya roja Çarşemî, nîşanda nerazîbûnekê bû li hemberî rewşa niha ya rejîma Îslamî ya Îran û ne gotin a du carî ya bi desthilatdariya vê rejîmê ji aliyê xelkê Kurdistanê bû, û tevî givaşên rejîmê û navendên serkutkar derheq vekirina deriyê dukan û şikandina girevgirtina van, îradeya bihêz ya neteweya Kurd serkevtî bû.

# Mehwî û sêgoşeya hebûn, terîqet û şerîetê

»»» Beşa 1

**N: Adil Qadirî**

Di vê nivîsarê de hewl hatiye dayîn bi metodeke hermenotîk, têgihîştin û vegotina Mehwî di nav sê rehend û cemserên hebûn, terîqet û şerîetê de bi mînaka du xezelên helbestvan bê ravekirin û derketin û kategoriyên hûr ên van cemseran li jêr navê eşq, mirin, îma û rexne û rengek ji pûçî û hesta absurd û vala ku girêdayî amadebûna zihnî û derûnî ya Mehwî ye, di nav rewşeke civakî û olî û guherbar a serdema wî de bê berçavkirin.

Eşqa dinyayî û esmanî di navbera terîqet û şerîetê de
Becê nayê, debê rûkeyne sara
Heqî adabî Mecnûnî le şara

Li vir Mehwî balê dikişîne ser wê yekê ku gihîştina rastî û heqîqeta eşqê bi şêweya wê ya Mecnûnî di vê rewşa nû de ku bajar derketiye holê, ne mumkin e û cihê rasteqîn ê eşqê sehra û çolistan e û eşqa Mecnûnî tenê li wir bi cih dibe.

Di vê şahbeytê de derdikeve ku ruhiyeta îzolebûn û nefreta ji civakê li ba Mehwî berçav bû û wek takekesekî tenêperest û dûr ji bajar û pergala nû ya nirxên wê nexasim di rûbera eşqê de dike.

Di berdewamiyê de her bi vê nerînê Mehwî dibêje:

Negeyme ew ciwane û geyîme pîrî
Meded ya pîrî pîranî Buxara
Leber zar û nezarî bûme wek pûş
De emca rabiwêre min be zara

Li vir pergala wênekirin û şênberbûna helbestvan şikl û teşeya xwe diguhere û wêneyekî dinyayî û nazikbar û estetîk werdigire. Berdeng an mixateba helbestvan di van herdu beytan de keçeke bedew û pozbilind û bêqisûr e ku zar û nezariya wî anku axaftin an neaxaftina wî bi yarê re, "yarê" tûşî bêzarî û nerehtiyê dike. Li vir "zar" du maneyan dide ku yek ji wan ziman e û ya din nexweşî û derdemendî ye. Lewra helbestvan ji yar daxwazkar e bila wek pûşekî ku ji "bê zarî/bêzarî" û "ne zar"iya wî wiha lê hatiye, bike bi "zara", daku ji zar û nexweşî û kaosê bikeve.

Herwiha di beyta yekem de helbestvan destê dua û lavakirinê ji bo pîrê pîranên Buxara, anku Behadîn Mihemed ku wek Şahê Neqişbend di Terîqeta Neqişbendî de naskirî ye, bilind dike û negihîştina wî bi wê ciwanê û pîrbûna ji qehra vê negihîştinê, pîrê pîranên Buxara tîne bîra wî û dibe ku wiha fikirîbe ku tevî ez bi riya negihîştina keçeke bêqisûr û pozbilind pîr bûm û hesretê ez pîr û kal kirim, bila ez xwe biguhêzim ser şêwaza îrfanî ya pîrê Buxara çimkî ez ji vê mam, bil ji wê jî nemînin!

Di berdewamiya vê xezelê de, Mehwî dibêje:

Were destê be xwênim ke nîgarîn
Xwênî min helalit bê Nîgara!
Zû ew şoxe le aşiq werdeçerxê
Legel kes, çerx e ew, naka mudara

Ke şik bem "Mehwiya" her şerbetî merg
Leser erza niye awî gewara

Mane û naveroka vê xezela Mehwî ji sê cemser an goşeyên wateyî pêk tê. Eşq, terîqet û tiwêjek ji felsefeyê ku di navbera terîqet û felsefeyê de hatiye parçekirin û dabeşkirin. Cemserê terîqetê xala firîn û azadbûna Mehwî ji îdeolojiya olê bi wateya wê ya şerîetî ye. Helbestvan di beytên sê û şeş de amaje dide du têgih û sembolên cîhana îrfanê, anku heq yan heqîqet û "hal". Cemserê terîqetê ji du cemserên din, anku eşq û felsefeyê cuda dike. Beytên din ên vê xezelê ji xeynî beyta dawî ku ez ê dûre li ser wê bisekenim, hemû têm û mane û hêmayên eşqê ne û bi pêkhate û zimanekî ku tenê û taybet ê Mehwî ye, hatiye hûnandin.

Du beytên zeq ên vê eşqa Platonîk di vê xezelê de ev in: Were destê be xwênim ke nîgarîn
Xwênî min helalit bê Nîgara!
Zû ew şoxe le aşiq werdeçerxê
Legel kes, çerx e ew, naka mudara
Li vir helbestvan behsa bêwefayî û kedînekirin û di heman demê de pirrengî û durûtî û pir maskebûna yarê li kêleka şox û şengiya wê dike. Di eynî wextî de, Mehwî behsa jan û birîneke "kûr û xweş" jî dike! Anku dibêje tevî ku yar wek çerxê gerdûn yan her çerxeke din e û bi kesî û ji bo kesî nas û kedî nabe û mudara ligel kesî nake, lê ev namudarayî ji ber şoxiya wê ye, ji ber bedewiya wê ye. Bi rastî ev nîşan dide ku Mehwî serwextê folklor û samana bi kom û marîfeta kolektîf a miletê xwe bû. Di seranserê folklora Kurdî de, yek ji wêneyên yara şox û şeng ew e ku bêwefa û zalim e û bi çarenivîsa aşiq dilîze. Di folklora Kurdî de, yek ji wêneyên zeq ên yarê ew e ku bi wê şox û şengî û bedewiyê dibe sedemê eşq û aşiqbûna yên din, lê ew bi xwe aşiq nabe, yan qe nebe eşqa xwe eşkere nake!



Mehwî di beyta dûre de dibêje:

Mujey xwênê deka her lehze, seyr e!
Emende gul le bin yek nûke xara

Ev beyt jî berdewamiya wê têm û naverokê ye ku min li jor qal kir û pêwendiya wê bi samana folklora Kurdî re diyar û zeqtir e. Anku yar bersiva evîndar û aşiqên xwe, bi tûjiyeke weke "strînan" dide û çend termên dildarên reben li pêş û paş bejna xwe ya pozbilind û serkêş li wê navê bêcan kirine.
Di beyta dawî ya vê xezela Mehwî de, rengek ji hêrs û serkêşiya felsefî li hember temamiya wan têgih û maneyên sembolîk ku min di beytên berê de qal kir, tê dîtin.

Ruhaniyeta rawî ku navê wî Mehwî be, ji ber şikestin û xopanî û mehwbûna wî ya berdewam di navbera têlbendên wateyî û têgihîyên wek eşq, heq, hal, şox, gul, xwîn, çerx, Mecnûn, sehra û hwd rastî rengekî ji xetimîna hebûnê tê.

Ke şik bem "Mehwiya" her şerbetî merg
Leser erza niye awî gewara

Wateya wê ji me re dibêje ku: Vebêjer wek ku di xetimîneke hebûnî de werbûbe, amaje dide ku bi berdewamî û "her" ligel mirinê rûbirû dibe û mirin tenê wek şerbetekê ku "her" wê dibîne, bêyî ku bimire, wêne dike; yanî mirina ku Mehwî behs dike, ne mirineke belav û berhest e, lê şêwaz û renc û jan û birînek e ku taybetmendiya cîhana dinyayî û materiyal, anku berhest û şênber e. Ev mane di beşê duyem ê beytê de pir baştir zelal dibe, dibêje bila wicûda her şerbeta mirinekê ku namirîne bi dest keve, ez ê bigihim wê akamê ku heta li vê cîhanê, anku ev cîhana vêga di xelek û pêkhateya marîfeta min de ye bijîm, ava gewara û şîrînşerbeta aram jî peyda nabe. Ev têma di metafizîka Mesîhî de li jêr navê "hebûn renc e", heta felsefeya hemdem hatiye...
**Dom heye**

# Zimanê Kurdî

- (Min û te, me hevalên hev in) .

Berevajî vê jî, li şûna ku em bêjin :
- Te û wî , we gul çinîn .
Dîsan ne dirust e ku em bibêjin :
-( Tu û ew, hûn gul çinîn) .

Lê di şêwezarê (K X) de komeke cînavan tenê heye.

Ew kom jî ev cînavên serbixwe ne : (min, to, ew, ême, êwe, ewan) . Cînavên vê komê di (K X) de li şûna cînavên her dû komên cînavên (K J) bikar tên . Mînak : Kurmanciya jorîn(K J) kurmanciya xwarê(K X)

| | |
|---|---|
| - Ez hatim | Min hatim |
| - Min xwariye | Min xwardime |

Seyda Sadiq Behadînê Amîdî di pertûka xwe de, ya bi navê (Rêzimana Kurdî)( ) dibêje : Dr. Cemal Nebez dibêjit( ) : Ji cudayêt di navbera kurmanciya jorî û jêrî, ji hêla morfolojî ve, cînav in . Paşê dibêjit, di kurmanciya jorî da dû corêt cînavêt kesî hene, corê yekê di awayê karayî (kiryarî, fa'ilî), di awayê palvedan û heyînê bikar tên . Corê dûwê ew in ku bi tenê di awayêt palvedan û heyînê bikar tên.

Zarê kurmanciya jorî bi vê xwemaliyê wekî kevnezimanêt Îranî ye . Belê kurmanciya naver-ast wekî zimanê Farisî yê nuwî ye, bi tinê corekê cînavan bikar têt . Paşê dibêjit, cihnavêt di awayê kara bikar tên eve ne : (ez, tu ew, em, hiwîn, ew) . Belê cîhnavêt di awayêt heyînê de eve ne : (min, te, wî, me, we, wan) . Ji vê gotina Dr. Nebez tê zanîn ku cînavên koma (ez), yên ku nuho di (K.J) de bikar tên di zimanê Avêstayî de jî bikar dihatin . Çiku Avêstayî jî yek ji wan zimanên kevne – Îranî ye . Digel ku roja îro cînavên koma (ez) di şêwezarê (K.X) de bikar nayên jî, lê şûnwarên hebûna wan hêj di hindek gotin û derbirinên vî şêwezarî de têne pelandin

- Li herêma Silêmaniyê ev penda pêşiyan tê gotin : (Eger zanî ez im,eger nizanî diz im ) .( )
-Helbestvanê gelêrî, Elî Berdeşanî dibêje :

"Ez im Elî Berdeşanî( ) beytê elêm be dîwanî"( )
Ji van mînakan tê zanîn ku cînavên koma (ez) di koka şêwezarê kurmanciya naverast de he-bûn, lê bi dirêjahiya demê re jê ketine û di şêwezarê kurmanciya jorî de mane.A- Koma (Ez) :

Cînavên koma (ez) ev cînav in : "Ez, tu, ew, em, hûn,( ) ew". Li gora cîgirtina navên kesan, ev cînav bi vî şêweyê jêrîn parve dibin : a-(Ez, Em) : cînavên kesê yekem ê peyiver in (yê ku di peyive) . - Ez : Bo kesê peyiver ê yekjimara her dû zayendan e (nêr û mê) .
Wek :
- Ferhad dibêje, ez ji Amûdê me .
Zînê got, ez ji Amûdê me .
- Em : Bo kesên peyver ên pirjimara her dû

# Tiştonek




A: Mahir Berwarî

- Tiştekî min heye li xanî malé bé ru bé dardaye. (* Pistîk)

- Tiştekî min heye lé ro digare digare, li şev te davi xwe jev dike dadiste. (* Maros)

- Tiştekî min heye bê digare bê şavî xwê qûrin. (* Çuçik)

- Tiştekî min heye li ave dixim naşke, li arde dixim dişke. (* Eq)

- Tiştekî min heye sarî minî mara qunî minî qunî tuccora. (* Şîşe lombo)

- Tiştekî min heye mange sor şak ber jur. (* Maşk)

- Tiştekî min heye buço şîqin di hewşu kin. (* Muj)

- Xangaka min heye serî xwe tiji raşk. (* Ecir)

Têdîtin: Amadekar destkariya devoka metelokan nekiriye

**Xwendevanên hêja! Hûn dikarin bersiva tiştonekan bi riya E-Maila Agiri2003@gmal.com ji me re bişînin**

Agirî

Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
www.Kurdistanmedia.com
www.Agirimedia.org
rojnamaagiri@gmail.com
www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (334)

## Şehîd Faroq û şehîd Muxtar tu carî namirin û wê bo heta-heta di dilê gelê xwe de bijîn

